# Bîlançoya 24 saetan: 38 çete hatin kuştin

**Qonaxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê a bi navê Şerê Tunekirina Terorê bê navber dewam dike. Şervanên QSD'ê derbên giran li çeteyand didin û pêşde diçin. Navenda Ragihandinê ya QSD'ê bîlançoya şerê 24 seatên dawî yê Pêngavê eşkere kir. QSD'ê diyar kir di 24 seatên dawî de 38 çete hatine kuştin.**

Navenda Ragihandinê ya QSD'ê bîlançoya şerê 24 seatên dawî ya qonaxa dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê ya bi navê 'Şerê Tunekirina Terorê' eşkere kir. QSD'ê got di 24 seatên dawî de 38 çete hatine kuştin.

Navenda Ragihandinê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bi daxuyaniyeke nivîskî bîlançoya şerê 24 seatên dawî ya qonaxa dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê eşkere kir.

QSD'ê di daxuyaniyê de ev agahî parve kir;

### ENIYA BAXOZ

Şervanên danê nîvro êrîşî baregehên terorîstan kir û di encamê de şerekî dijwar qeiwmî. Di şer de gelek çete hatin kuştin. Pêşveçûna şervanên me li vê eniyê diodome, çete neçar dimînin birevin. Çeteyan piştre êrîşî şervanên me kirin û êrîş hate şkandin çete neçar man paşve birevin.

Balafirên Koalîsyona Navnetewî gelek baregehên çeteyan kir hedef û di êrîşê de wesayîteke bombebarkirî ya çeteyan hate rûxandin. Hejmara kuştî û birîndarên çeteyan nehate zelalkirin. Topavêjên koalîsyonê her wiha 2 wesayîtên bombekirî teqandin û çeteyên tê de hatin kuştin

Li eniya Baxoz bi demkî şer heye, topbaran, êrîşa bi hawan û dokçayan car car derikeve.

### ENIYA HECÎN

Li vê eniyê di navbera şervanên me û terorîstên DAÎŞ'ê de şerekî dijwar heye. Şervanên me karibûn li vê eniyê jî pêşve biçin û 6 xalên nû ji terorîstan rizgar kirin. Şervanan li van deveran pêngava paqijkirinê pêk anî û di encamê de miqdareke mezin a çek û cebilxaneyê desteser kirin. Şervanan her wiha 2 mayinên ku terorîstan çandibûn, teqandin.

Çeteyên DAIŞ'ê xwest êrîşekê li dijî xalên şervanên me bi balafirên bêpîlot pêk bînin. Şervanan ev balafir xistin xwarê.

Li vê eniyê her wiha pevçûnên demkî rû didin û topbaran car bi car dubare dibe.

### ENIYA EL-SÛSÊ

Piştî şerê dijwar ku 3 rojan di navbera şervanan û çeteyan de dom kir, şervanan gundê Mozan ê nêzî bajarokê Sûsê rizgar kir û terorîstên DAIŞ'ê jê qewitandin. Tîmên bêbandorkirina mayinan, mayinên ku çeteyan çandine, bê bandor kirin.

### BÎLANÇO

- Xalên ku hatine rizgarkirin: 6
- Hejmara kuştiyên terorîstan: 38
- Hejmara terorîstên bi saxî hatine girtin: 3
- Ziyanên bi terorîstan bûne: Topavêjeke hewanan hate rûxandin, baregeheke çêkirina mayinan hate rûxandin, 3 siwareyên bombekirî hatin rûxandin, baregeheke çeteyan û 2 treksên çeteyan hatin rûxandin.
- Çekên şervanan desteser kirine: 2 heb RBG, hebek M16, 6 heb kalaşnîkof, zincîrên guleyên BKC û firokeyeke bêpîlot
- 2 mayinên ku çeteyan çandibûn, hatin teqandin.
- Êrîşên ezmanî yên Koalîsyona Navneteweyî: 8."



## Li Endonezyayê hejmara miriyan bû hezar û 558



Li gorî daxuyaniya Ajansa Rêveberiya Karesatên Netewî ya Endonezyayê (BNPB) hejmara kesên di erdhej û tesûnamiyê de mirin, bû hezar û 558 kes.

Hatibû ragihandin ku di erdhej û tsûnamî de ya li Endonezyayê 2 hezar û 539 kes birîndar bûbûn û zêdetirî 100 kes jî winda ne.

Li Sûlawesî ya yek ji çar giravên mezin ên Endonezyayê ye, roja Înê 2 edhejek bi pileya 7,5'an pêk hatibû. Li pey wê tsûnamî jî pêk hat.

Piştî erdhejê li bajarên Dongala û Palû pêla tsûnamiyê heta 3 û 6 metreyan bilînd bûbû.

Buroya Koordînasyona Karê Mirovan a NY'yê, di daxuyaniya xwe ya roja Yekşemê dayî de, diyar kiribû ku pêwîstî bi alîkariya lezgîn a ji bo 129 hezar kesî heye. Ji vana 46 hezar zarok û 14 hezar jî kesên bi temen in.

## *Dewleta Tirk wê sed mîlyon dolar ji zeytûnên Efrînê bigire*



Di navbera komên çete yên Ehrar El-Şerqiye û Koma Edil ku ji Ehrar El-Şerqiye veqetiyaye de, şer pevçûn derketin. Hate zanîn ku şer ji ber parvekirina zeytûnan ên welatiyên Efrînê pêk hatiye. Komên çete yên girêdayî dewleta Tirk li Efrînê li ser parvekirina zeytûnan şerê hev dikin.

Li gorî çavkaniyên ji herêmê ragihandin, li Efrînê ji ber parvekirina zeytûnan a welatiyên Efrînê, di navbera koma çeteyên Ehrar El-Şerqiye û koma çeteyan a Edil de li gundê Qujîma yê Cindirêsê şer rû didin.

Heman çavkaniyan diyar kir ku welatiyên Cindirêsê nikarin biçin nava zeviyên xwe û zeytûnên xwe wergirin. Bi taybet kiryarên komên çete di van demên dawî de zêde bûne û dest datînin ser zeytûnên gel.Walîtiya Hatayê yê Tirkiyê di belavokekê de ji hemû komên çete xwest ku zeviyên zeytûnan yên desteser kirine, radestî koma bi navê Meclîsa Hundirîn a girêdayî dagirkeriyê bikin. Li hemberî vê yekê pirraniya koman nexwest zeviyên zeytûnan radest bikin û di encamê de nakokî di navbera komên çete de derdikevin. Meclisa Hundirîn a Cindirêsê ya girêdayî dagirkeriyê jî bac li ser welatiyan ferz kirin da ku karibin hilberîna xwe ya zeytûnan wergirin.

Girêdayî mijarê cîgirê Serokatiya Desteya Çandiniyê ya Kantona Efrînê Selah Îbo ragihand ku Tirkiye hewl dide 100 milyon dolar ji hilberîna zeytûnên welatiyên Efrînê bidize.

## Dozgeriya Tirk derbarê 9 wekîlên HDP de fezleke amade kir



Serdozgeriya Komarê ya Enqereyê derbarê 9 wekîlên HDP'ê de bi daxwaza "destnedayîna wan bê rakirin" fezleke amade kir.

Serdozgeriya Komarê ya Enqereyê der barê 9 wekîlên HDP'ê de 15 fezlekeyên cuda amade kir û ji bo li Meclîsê bê nirxandin ji Wezareta Dadê re şand. Serdozgeriyê bi îdiaya "Propaganda rêxistinê kirin e" ji ber axaftinan der barê Pervîn Buldan, Ayhan Bîlgen, Ayşe Acar Başaran, Alîcan Onlu, Berdan Ozturk, Bedîa Ozgokçe Ertan, Feleknas Uca, Fîlîz Kerestecîoglu, Kemal Bulbul, Meral Daniş Beştaş, Îmam Taşçier û Nîmetullah Erdogmuş de fezleke amade kir.

## Serokê Înterpolê Hongweî winda bû

Serokê Înterpol Meng Hongweî di dema serdana ji bo Çînê de winda bû, li ser vê li Fransa lêpirsîn hate destpêkirin.

Welatiyê Çînê Serokê Înterpolê Hongweî, ji serdana dawiya meha Îlonê ya ji bo Çînê û vir ve ti agahî jê nayê girtin. Hevjînê Hongweî yê li Lyonê dijî, têkildarî windabûna Serokê Înterpolê hişyarî da meqamên Fransî.Li gorî çapemeniya Fransa ragihand ku çavkaniyên nêz ên lêpirsînê diyar dikin ku Hongweî li Fransayê winda bûye.

Navenda Înterpolê ya Teşkîlata Polîsan a Krîmînal a Navneteweyî li bajarê Lyonê ye. Lêpirsîn jî li Lyonê destpê kiriye.

Hongweî dawiya sala 2016'an li şûna Mîreîlle Ballestrazzî ê Fransî ji bo serokê Înterpolê hatibû hilbijartin. Hongweî beriya wê li Çînê alîkariya Serokê Ewlekariya Civakî kiribû, yek jî kesên girîng ê Partiya Komunîstê bû.

## HPG'ê li Bazîdê lêda, 11 leşker hatin kuştin



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê 3'yê Cotmehê li Bazîdê wesayîteke zirxî ya artêşa Tirk rûxandine, di vê çalakiyê de 11 leşker hatine kuştin, 7 jî birîndar bûne.

Li gorî daxuyaniya li ser malpera fermî ya HPG'ê hate belavkirin, 4'ê Cotmehê li navçeya Çelê ya Colemêrgê çalakiyek hatiye kirin û 2 leşker hatine kuştin. HPG'ê ragihand ku li navçey Elkê ya Wanê jî kolberek ji aliyê artêşa Tirk ve hatiye kuştin.

Di daxuyaniyê de HPG'ê ev agahî parve kir:

### WESAYÎTA ZIRXÎ HATE RÛXANDIN

"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Serktinê ya Şoreşgerî ku li gelemperiya Eyaleta Serhedê hatiye destpêkirin de, 3'yê Cotmehê saet 07:30'î de li dijî artêşa Tir ka dagirker li navçeya Bazîd a Agiriyê çalakiyên hemwext hatine kirin.

Hêzên me girên ewlekariya Qereqola Vedat Ozkaya û Qereqola Alî Beg kirin hedef û çalakiyek kirin. Di vê çalakiya bi xurtî li çeper, kozik û wesayîtên zirxî yên li herdu giran hatin xistin de tankek û wesayîteke zirxî û cîhaza radarê li ser hate rûxandin. Di van çalakiyên hemwext hatin kirin de bi qasî hate zelalkirin 11 leşker hatine kuştin, 7 jî birîndar bûne.

Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de 4'ê Cotmehê saet 12:30'î li dijî leşkerên artêşa Tirk a dagirker ên li Girê Xergol ên girêdayî navçeya Çelê ya Colemêrêg çalakiyek kirin. Di vê çalakiyê de ku kozik û çeperên dijmin hatin hedefkirin, bi xurtî hatin lêdan û 2 leşker hatin kuştin.



# Girê Leylan xwedî dîrokek dirêj e

**Li Rojavayê Kurdistanê gelek cihên dîrokî hene. Van deverên dîrokî ji gelek şaristaniyan re malavanî kirine. Yek ji wan deverên dîrokî jî Girê Gundê Leylan yê li navçeya Tirbespiyê ye. Li gor belgeyên dîrokî û vekolînan Girê Leylan yek ji navendên Akad'an buye.**

Gundê Leylan ê navçeya Tirbespiyê bi girê xwe yê dîrokî navdar e. Gelek şûnwarên ji serdema Akad'an de mane lê hene.

Gundê Leylan bi 8 km dikeve bakurê navçeya Tirbespiyê. Gund bi girê xwe yê dîrokî navdar e. Şûnwarên gir heta niha mane. Derdora 150 sal berê gund li rex girê dîrokî hatiye avakirin.

Li gorî lêkolînên dîrokî ku behsa gundê Leylan dikin, diyar dikin ku di wê demê de bajarek bû û navê wî Şexna bû. Di salên di navbera 2300`an heta 2200'an B.Z. de di bin serweriya Împarotariya Akadan de bû ku gelek navendên Akadî li herêma Xabûr ava kiribûn. Ji delîlên ku hebûna Akadan li vê herêmê îsbat dike, hatine vedîtin. Akadiyan bajarê nizm bi sûreke parastinê gelek mezin bi qalinbûna 8 metreyan ava kirin. Di dema Akadiyan de bajar ji aliyê çandiniyê û aboriyê ve geş bûbû. Akadiyan gelek avahiyên giştî wekî perestgeh ava kirin û ayînên baweriya Akadiyan lê pêk dianîn.

Li gorî şandeya Amerîkayê ya ji Zanîngeha Yale bi rêveberiya Harvî Ways di sala 1979'an de ku li gir vekolîn kirine, hate diyarkirin ku dîroka gir vedigere serdema Hamûrrabî.

Şandeya Amerîkayê di nivîsandina raporên xwe de ruqmên mixî û peykerên axî ku di vekolînan de dîtine, bingeh girtin. Xebatên vekolînê heta destpêka aloziya Sûriyê sala 2011'an berdewam kiribûn. Li gorî kesên ku haya wan ji raporan heye destnîşan kirin ku şandeyê di raporên xwe yên ku radestî hikumeta Sûriyê kiribûn de diyar kiribûn ku girê gundê Leylan ji girîngtirîn cihên stratejîk ên serdemên kevn e. Her wiha di wê demê de cihekî bazirganiyê yê girîng bû û tê de depoyên genim hebûn. Şêniyên wê bi pirranî bazirganî dikirin. Heta niha jî şûnwarên depoyên genim lê hene.

Li gorî welatiyekî gundê Leylan ê bi navê Mehmûd Mihemed Abdulezîz, şandeyên Amerîkayê û Ewropayê xwendekarên xwe dianîn van cihên dîrokî û ew bi awayekî pratîk fêrî prosesa vekolandinê dikirin. Her wiha Abdulezîz diyar kir ku aşê avê yê ku dikeve bakurê rojavayê gir, heta beriya çend salan dixebitî. Lê ji ber girtina dewleta Tirk ava çem û kaniyan, çemên navçeya Tirbespiyê hişk bûn û di encamê de aş jî rawestiya.





### LEYLAN HEDEFA ÊRÎŞÊN DAIŞ'Ê BÛ


Bi destpêka aloziya Sûriyê di sala 2011'an de, çeteyên DAIŞ'ê û Cebhet El-Nusra di yekemîn êrîşên xwe de li ser Rojava, gund kirin hedefên êrîşên xwe. Di nav salekê de hewl dan gund dagir bikin, lê şervanên YPG'ê êrîşên çeteyan şikandin û destûr neda ku çete nêzî gund û girê wî bibin…*ANHA*

## Li Silêmaniyê eleqeya ji bo pirtûkên Ocalan

Li Silêmaniyê Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê û Tevgera Jinên Ciwan ên Têkoşer ji bo balê bikişînin ser tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan standa pirtûkên Ocalan danîn.

Ciwanan bi armanca balkişandina ser tecrîdkirina Rêber Ocalan û girîngiya fikrên wî ji bo çareserkirina pirsgirêkênn gelan li ber Parka Baxê Giştî ya Silêmaniyê standa pirtûkan danîn.

Stand wê her roja Pêncşemê li ber Parka Baxê Giştî û Cadeya Seholeke bê danîn. Di standê de pirranî pirtûkên Ocalan, pirtûkên felsefe û sosyolojî yên ku naveroka wan li ser çareserkirina piragirêken civakê ne cih digre. Welatiyên Silêmaniyê eleqeyek zêde nîşan dan.



## Huner ji bo pêşerojê pêwîste



**Rotînda YETKÎNER**

Huner ji bo mirovatî paşeroj û pêşeroja xwe bibîne, binase û têbighêje, ji despêka jiyana mirovati heya dema ku em têde dijîn berdewam dike. Vê îdiayê ez nabejim, zanyar, porspî û lêkolînvan û dîrokazan dibêjin. Ez niha pirtuka Andrew collins a bi navê "Gobeklî Tepe" dixwînim. Ev mirovê arkeolog û dîroknas carek din cihanê pêdihesîne ku, warê Kurdistan ji despêka jiyana mirov de buyê cîhê çand û hunerê. Binêrin ger huner neba îro me yê nizaniba ka kijan dem û bi çi awayê jiyana mirovatiyê despêkiriye. Di lêkolînên dîrokî û arkeolojîk de em dinasin û dixwînin ku mirov ji vêya pazde hezar sal berî bi riya hunerê jiyana wan deman û pêşketinê çandî bi riya hunerî raxistiye berçavan. Ger ev hunera wan dema tunebuya, îro me nedizanî ji vê ya çend hezar salan berê, mirovahî di çi rewşê de buye. Em ji van lêkolînên arkolojî û dîrokî û bi riya hunerên wê demê hatine afirandin têdighêjin. (B.M) 19.000 de li Zagrosan û li Kafkasya çanda Zarzîna hebuye. (B.M) 9600 de li Ruha (Gobeklî Tepe) çandek gelek pêşketî avabuye. (B.M) 8630 de li Anatolya û (B.M) 8500 li Newala Çorî çandek gelek pêşketî hatiye afrandin. Her waha bi riya berhemên hunerî dîroka mirovahî îro tê nasîn.

Mabesta min di vir de ne ku ez bi we dîroka mirovatiyê an jî li ku derê çi hatiye jiyandin bidim nasîn, dixwazim bêjim huner û çand ji bo pêşerojan û ji bo nivşên li du me, mîrata herî bê hempaye û mirovatî bi vê re dikare xwe bighîne demên pêşî.

Tevgera Azadiyê bi hewildan nûvejîna 1984'an rûpelek bi ar û şoreşek bêhempa û civaka di xewa mirinê de şîyarkir û kir peşengê mirovatiyê. Ev şoreş bi cangoritiya keç û xortên leheng pêkhat û hê jî berdewame. Divê me çewa artêşek avakir ji bo ku gelê bi çanda xwe despeka mirovati avakiriye bighêje azadiya bi rûmet, divê bi eynî armance ji bo huner jî tevgerek mezin bihata afrandin.

Li qada hunerê ne ku kesek deng xweş an hinek pêkenok dizane bibe şanoger û an jî hevokên slogan li du hev rêzbike û bibe şaîr bihata avakirin. Divê me çawa li qada gerîlla bi hasasiyetek mezin tim tarz û hacetên nû diafirand û heya em gihiştin tarza fedayitiyê, di qada hunerê de hê ji wê bêtir divê hasasiyet hebuya.

Ger em dixwazin, ev bi deh hezaran cangoriyên ciwan ku ji bo azadiyê xwe fedakirin neyên ji bîrkirin.

Ger em dixwazin, ev keda hevalên pêşeng, gel û hewqas tekoşîna giran bi encam bibe û bighêje dahatuya me.

Ger em dixwazin, bi riya hunera resen ev keda çil salan ku bi keda şehîdan hatiye afirandin bi wate bibe û ev gelê qedîm li ser axa xwe jiyanek azad bijî û berdewam xwe vê bi armancê bide jiyandin, divê em qada hunerê sererast bikin.

Hunerê ji bo pêwistiyên rojane bi kar neynin û ji nêrîna şev û dewetan dûr bixînin.

## Di nava civaka Kurd de kast



**Sîpan ŞÎNDA**

Di dîrokê de her civakê li gor şiklê jiyana xwe ji xwe re pergalek danîye. Ev pergalên henê ji di nava demê de rûniştine û him bûne bingehê têkiliyên jiyana civakî, him ji bûne pergala serdest ya civakê bi revê dibe. Ka bi kurt em berê xwe bidin pergala kastê.

Kast, ji pergala ferq û cudahiyên di nava çînên civakî de dide xwiya kirin re tê gotin. Pergala kastê, li gelik welatan bi şiklên cuda hatiye jiyîn. Lê ya herî tê zanîn û herî hişk hatiye jiyîn pergala kasta Hindistanê ye. Ev pergal her çend ne weke berê hişk û belav be ji, lê niha ji li hinik deverên Hindistanê, Efrîqa, Çînê tê jiyîn. Bingehê pergala kastê li ser zewac û parve kirina meslegan hatiye danîn. Endamên kasta, di nava xwe de dizewicin. Destûr nine kû yek ji kastekê bi endamê kasteke din re bizewice. Herweha meslek girtin ji di nava kastê de tê diyar kirin. Di nava kastan de derbas bûna meslega nine. Di nava civaka Kurd de, her çend ne weke li Hindistanê hişk be ji, lêbelê pergala kastê heye. Di nava Kurdan de çînên weke Mîr, Beg, Axa, Sêx, Seyît, Kurmanc, Xwilam, Xadim hene. Ev çînên henê her yekê di nava wan de ferfq û cudahî çêbîne. Mînak ji kurên Mîran re dibêjin "Mîrza", ji keçên wan re dibêjin "Sitî". Di nava van çînan de, jiyana wan gelik ji hev cuda hatiye jiyîn. Mîr û Bega meznatî û serweriya herema kirine, axa mezinatiya êl û eşîra kirine, Sêx û Seyîda xwe li xwendin û olî anînê pêş, Xwilam û Xadiman xizmeta Mîr, Beg, Axa kirine, Kurmanca ji bazirganî, rênçberî, cotyarî û karên din kirine. Emê bi çend mînakan vekin. Di nava civakê de gelik caran ji ber vê kastê "kêmî xwe dîtin" heye. Mînak xwilam û xadiman li ser sifra Mîr, Beg, axayê xwe xwarin nedixwarin. Xizmet dikirin heta xwarina wan ji ber wan radikirin nû wan xwarin dixwarin. Eva çînên serdest di nava xwe de jin dane hevdû, lêbelê keçên xwe nedidan Kurmanca yan ji xwilaman. Bes ewan carna keçên maldarên Kurmanca ji xwe re anîne. Hinek Seyîd niha ji vê diparêzin û dibêjin çênabe kû em keçên xwe bidin ji xeynî Seyîdan. Dîsa ji aliyê olan ve herweha ev rewş heye. Di nava Kurdên Misilman û Êzidî de jin dan û anîn nîne. Strana Kirîvê ji bo vê mînakek berçave. 'Ji me re bûye sûc, ez misilmanim tu ji êzidiye'. Heya niha ji gelik Kurdên ji herdû olan vê diparêzin hene. Dîsa di straneka Kurdî ya şeran de ev pergala kastê bi awayekî eşkere derdikeve pêş. Strana Ferhoyê Izêr Axa, li ser şerê di navbera Kurdên Misilman û Êzidî de hatiye gotin. Dema di şer de Mamê Qiligî rimekê li caniya Ferho dide û birîndar dike, xwilamê wî Heso tê li ber Ferho Axa peya dibe û dibêje: Bila sere min gorî serê axayê min be, bila caniya min gorî caniya axayê min be… Ferho dibêje Heso nabe…, axa tu cara li caniya xwilaman siwar nabe! Her çend Ferho di nava şer de maye peya ji lê ew dîsa ji dibêje nabe ez li hespê xwilamê xwe siwar bibim. Ji ber kû wî kêmî xwe dibîne. Raste, îro di nava civaka Kurd de ev pergal hema bêje nemaye. Lê bi temamî ji hole rakirina vê pergalê li dinyayê hêj kêm kêm wê sedsalan bistîne.

# Zivistan nêzîk dibe tevger zêde buye

**Piştî ku bajarê Reqayê ji dagirkeriya DAIŞ'ê hat rizgarkirin li û tevgera bajêr zêde buye û ji nûve jiyana bajêr geş û zindî dibe. Bi hatina zivistanê re wealtiyên Reqayê ji bo kirrîna pêdiviyên zivistanê weke sobe û cil û bergên zivistanê herikîn sûkên bajêr.**

Bi hatina zivistanê re şêniyên Reqayê ji bo kirrîna pêdiviyên zivistanê wekî sobe û cil û bergan herikîn sûkê. Stasyona Sadkobê ji her malbatekê re 400 lître mazot diyar kir.

Piştî ku bajarê Reqayê ji dagirkeriya DAIŞ'ê hat rizgarkirin gelek firoşkaran dikanên xwe ji nû ve vekirin. Bi hatina zivistanê re şêniyên Reqayê û gundewarên wê ji bo kirrîna pêdiviyên zivistanê wekî soba û cil û bergên zivistanê herikîn sûkên bajêr.

Komîteya Karûbarên Civakî bi hevkariya rêxistinên ku li Reqayê dixebitin, alîkarî li malbatên hewcedar belav kir. Belavkirin bi rêya meclis û komînên tax û gundewarên Reqayê pêk tê.

Têkildarî mijarê her du rêxistinên Rojava û El-Mewde yên ku bin banê Buroya Rêxistinan a girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê kar dikin 2 hezar û 500 paketên xwarinê li taxa El-Nehda û gundewarên Reqayê belav kirin.

Bi nêzîkbûna zivistanê re Meclisa taxa El-Nehda bi rêya komînan, hejmara malbatên xizan û hewcedar diyar kirin û li gorî hêjmarê 700 malbat li taxên El-Huriyê, El-Firat, El-Tewesuiyê û El-Temînat El-Ictîmaiyê hatin tesbîtkirin. Her wiha xebatên belavkirinê li taxên El-Rimêlê û El-Mişleb têne meşandin. Beriya zivistanê rêxistinan xebatên belavkirina sobayan li malbatên hewcedar didomînin.

Mazot jî bi rêya meclis û komînan wê were belavkirin. Girêdayî mijara belavkirina mazotê Endamê Rêveber ê Stasyona Sadkobê Xelîl Ereb wiha got: "Ji bo wergirtina mazotê ji stasyonê wê komîteyek were avakirin û wê mazotê li welatiyan belav bike. Em wek rêveberiya Sadkobê xebatên belavkirinê dişopînin û em li giliyên welatiyan guhdar dikin. Ji bo her malbatekê 400 lître mazot hatiye diyarkirin û bi nirxek ji sûkê erzantir wê du caran were belavkirin."…*ANHA*





## 5 Melyon lître mazot li Qamişlo hatiye belavkirin



**Ferîşte NEZÎR**

Bi rast hatina demsala zivistanê re û di çarçoveya alîkariya bi welatiyan re, Komîteya Sotemeniya bajarê Qamişlo û gundewarê derdora wê, ku ji meha Tebaxê dest bi belavkirina madeya mazotê j bo zivistanî kirine û heya niha 5 melyon lître mazot li herdu navçeyên milê Şerqî û Xerbî belavkirine. Lê hîn jî xebatên belavkariyê berdewam me.

### Bİ RÊXİSTİNÎ MAZOT TÊ BELAV KİRİN

Têkîldarê mijarê Hevseroka Rêveberiya Sotemeniya Bajarê Qamişlo Reca Ismaîl derbarê belavkirina mazot ev agahî dan: "Ji bo ku belavkariya mazotê bi rengekî rêxistinî bê belav kirin, em di riya herû naçeyên bajarê Qamişlo ya milê Şerqî û xerbî de têkîlî avakirin ku di riya komîteyên xizmetgûzriya Navçeyê de belav dikin. Ev komîte li komînan belav dikin û komîteya xizmetgûzriya komînan mazotê li malan belav dike."

### EV DU MEHİN MAZOTÊ BELAV DİKİN

Reca da zanîn ku hazirtiyên wab hebûn ku di meha Temûzê de dest bi belavkirina mazotê bikin lê, gel hîn hazirtiyên xwe nekirbûn û wiha got: "Ji bo wê jî di 11'ê Tebaxê dest bi belavkirina madeya mazotê kirine. Ku wekî Rêveberiya Sotemeniyê rojana mazot dide komîteya navçeyê û ev komîte li komînan belav dikin, ku serê malekî 400 lîtir mazot yanî du bermîl bi buhaya 52 lîreya Sûrî, her wiha li penaber û koçberan jî bi heman rêbazî tê belav kirin."

### Jİ 70 HEZAR MALÎ Lİ 15 HEZARÎ HATİYE BELAV KİRİN

Reca bal kişan ser dereng mayîna belavkirnê û got: "Malbatin hene ku hîn bermîlên wan tune û hin ji wan jî perê wan nîne, ji bo wê jî ew kesana dê bibînin di beşê duyemîn ji belav kirinê, ku heya niha nêzî 5 melyon lîter mazot ten li bajarê Qamişlo hatiye belav kirin. Di heman demê de nêzî 70 hezar malin li Qamişlo hene û heya nih nêzî 15 hezar malan mazot hatiye belavkirin. Ku rojek erê û rojek na maot tê ji mere û 8 sehrîcên me henû dema ku tê tenê ji bo jenetor û wesaytiyan didin û yên din hemû ji bo demsla zivistanî didin malan."

## *Welatiyên gundan malên xwe amade dikin*



Bi hatina zivistanê re şêniyên gundên girêdayî herêma Cizîrê bi hev re dixebitin û xaniyên xwe ji nûve herî dikin.

Xwediyên xaniyên ax yên gundewarên herêma Cizîrê mîna her sal bi nêzîkbûna zivistanê re dest bi herî kirina xaniyên xwe dikin.

Li gorî şêniyên navçeya Til Hemîsê rêjeya xaniyên axî yên navçeya Til Hemîsê û gundewarên wê nêzî ji sedî 85 e. Hemû xanî her sal di destpêka meha Cotmehê de tên herî kirin. Têkildarî mijarê welatiyê bi navê Ibrahîm Meter ê ji gundê Naim El-Celad ê got: Welatî her du salan carkeê ji nû ve heriyê lê dikin. Her wiha banê xaniyan salê carekê tê sererastkirin. Meter got: "Ji berê ve şêniyên gund xaniyên xwe herî dikin. Hemû gundî di vê mijarê de alîkariya hev du dikin...*ANHA*

## Li Dibistanên Reqayê hejmara xwendekaran zêde dibe

Ji ber xebatên Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya Meclisa Sivîl a Reqayê hejmara xwendekaran li dibistanên Reqayê zêde dibe.

Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya Meclisa Sivîl a Reqayê ji bo bilindkirin û pêşxistina asta perwerdehiyê xebatan xwe didomîne.

Şêwirmendê perwerdeyê Ehmed El-Hisên diyar kir ku hejmara xwendekaran bi awayekî mezin zêde dibe û da zanîn zêdetirî 27 dibistan bi temamî wêran bûne. El Hisên wiha got, "Ji ber wê me mal kirê kirin û wek dibistan vekirin. Ji ber ku xwendekar nêzî 4 salan ji xwendinê qut bûbûn, me wan dabeşî astên seretayî û amadehî kir û sibe û êvaran dewam dikin. Her wiha hinek dibistan bê pencere û derî ne."



Ehmed El-Hisên wiha dewam kir: "Kêmasî di kadroyên perwerdehiyê de ji bo asta navîn heye. Ji ber wê me hinek mamosteyên ku hê jî zanîngehên xwe neqedandine erkdar kirin." Ji rêveberên dibistana Elî Bin Ebû Talib Yûsif El-Kedro got: "Bi nêzîkbûna vekirina dibistanan me zêdetirî hezar û 400 şagirtên seretayî û amadehî tomar kir. Hejmar her ku diçe zêde dibe."…
*ANHA*

ÇARE



## Dîplomasî

**Sîpan CAN**

Berî niha bi sedên salan, ji bo hev û din naskirin, qewm û netewên dixwestin di navbera xwe de têkilî û dan û standinan çêkin, yan bi riya bazirganiyê dikarîn welat û xelkên wê nasbikin. Tenê ew rê hebû, her wiha nameyên nivîskî yên bi kevokan dibûn wesîleya agahdarkirin û rgihandina di navber klanan de.

Ev çalakî di dema me ya niha de jêre dibêjin diplomasî. Ev têgeh nûye jêdera vê gotinê latînî ye. Diplom tê wê wateyê ku belgeyekî fermî ye ku di navber du welatan ku peyman û tifaqan îmze dikine ye. Bi gotinek din, diplomasî wesîleya goftugokirina di navber du aliyan, ango du welatan, du kesan, du hêzan...hwd

Li gorî hin danasînan, diplmasî naskirina aliyê din yên meselê ye. Naskirin ji gelek aliyan ve jî tê teyisandin. Naskirina hêz, hizir û zanista aliyên meselê. Em hîna zelaltir bikin. Diplmasî gelek cureyên xwe hene. Leşkerî, siyasî, çandî, zanistî... hwd.

Li Rojavayê Kurdistan her wiha bakur û rojhilatî Sûriyê kîjan diplomasî tê meşandin em hinekî roniyê bidin vê mijarê. Ya girîng ew e divê em zanibin eger ji hemû cureyên diplomasiyê neyên meşandin, ne gengaze ku em bibêjin em diplomasiyek têr û tije didin meşandin. Wê helbet aliyên kêm yên meselê hebin. Niha ya herî li pêş ku di serdema van çend salên şoreşê de em dibînin. Bi awayekî gelemper diplomasiya tên meşandin a leşkerî ye. Ji destpêka damezrandina YPG û YPJ û her wiha QSD'ê piraniya aliyên din yên meselê ku niha wek kolasiyona navnetewî tê bi navkirin li ser bingehekî ango di bin navê şerê li dijî terorê hevkariya xwe bi hêzên hatine destînaşkirin re didin meşandin. Lewma ev têrê nakê, li gel vê diplomasiya leşkerî eger diplomasiyek têrker ji aliyên çandî û siyasî û her wiha neyên meşandin wê gelek zehmet be ku tecrubeya li vê herêmê bi cîhanê bidin naskirin. Tenê di cîhanê de şoreşa Rojava wek şoreşekî mîlîtarî ku şervanên wê wêrek û bê hempa ne tê meşandin. Dibe ku ev deriyekî li pêş diplomasiyeên din veke; lê di heman demê de em jî nizanin kilîta wan deriyan bi dest xwe bixin û ji hemû aliyên vê mijarê em karibin xwe û şoreşa xwe bidin naskirin.


Eger em diplomasiya Rojava her wiha bakur û rojhilatî Sûriyê baş binirxînin em dikarin van encaman derxînin holê. Di asta leşkerî gotin li ser nabê ji ber ya herî zêde ew tê meşandin. Di milê siyasî de tenê bi yek du kesan ve sînordar e, ango me nikarî siyastemedar biafirandana. Ji aliyên çandî ku lêkolînvan dibêjin ya herî girîng û bi bandora zîro ye. Ji xwe ji milên zanistî û her wekî din jî zîro ye. Yanî, niha piştî heşt salan, di nava saziyan de ewqas kesn ku dikarin semîner, hewlest û şoreşê bidin naskirin heye; lê tenê mîna me gotî bi yek du kesan ve girêdayî maye, ma gelo di vî welatî çiqas rêveberiyên saziyan yên ciwan hene, ku dikarin bi dehê mijar û dosyayan amede bikin û li welatên cîhanê bibin degê gelê xwe. Lê; mixabin, rêveberiya vî welatî ne rol û ne jî îtîbar daye nifişa ciwan ku di demên pêş wê ew bibin rêvebirên vî welatî.




# Emê têkoşîna xwe bilind bikin

**Li dijî tecrîda li ser Rêber Ocalan çalakiyên jinan berdewam dikin. Jinên taxa Şêxmeqsûd ya Helebê nerazîbûn nîşanî tecrîda li ser Ocalan dan û diyar kirin ku ew ê heta dawiyê têkoşîna xwe ji bo azadiya Rêber Ocalan bidomînin. Jinan wiha got, "Jin îro bi fikrên Ocalan li hem kom dibin û têkoşîna azadiyê dikin."**







Jinên taxa Şêxmeqsûd nerazîbûn nîşanî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dan û diyar kirin ku ew ê ji bo azadiya Rêber Ocalan heta dawiyê têkoşîna xwe dewam bikin.

Jinên taxa Şêxmeqûs a Helebê yên ku beşdarî çalakiyên konvedanê ya ku Kongreya Star a bi armanca şermezrkirina tecrîkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bûne, axivî û diyar kirin ku ewê heta dawiyê ji bo azadiya Rêber Ocalan têkoşîna xwe bidomînin.

Endama Kongreya Star Sîham Bîlal diyar kir, ew bi ew ê çalakiyên xwe li dijî dagirkeriyê dewam bikin û got, "Çalakiyên me ew ê berdewam bikin û em ê dengê xwe ji bo azadiya Ocalan bilind bikin."

Sîham bang li hemû jinên taxê kir ku beşdarî çalakiyan bibin û got: "Mil bi mil em rêberê xwe azad bikin."Emel Horo ya ji pêkhateya Turkmen got: "Bi rêya çalakiya konvedanê em nîşanî cîhanê didin ku felsefeya Ocalan me li hev kom kirin û em bi fikrê wî dimeşin. Dijmin bila zanibin em ê li ser fikir û felsefeya Rêber Ocalan bighêjin azadiya xwe û emê bi têkoşîna xwe rêberê xwe azad bikin."

Fatma Misto ya ji pêkhateya Ereb jî bang li rêxistinên navdewletî û mafên mirovan kir ku bi lez destwerdana tecrîdê bikin û wiha dgot: "Divê sînorek li ber kiryarên dewleta Tirk were danîn. Êdî sebra me nema. Heta ku rêberê me azad nebe em ê tekoşîna xwe dewam bikin."…*ANHA*

## Aboriya jin şerê duyemîne di şoreşê deye



**Melek DEMÎRTAŞ**

Jin aboriya civakê jî pêşdixe. Ji ber ku jin mîna tova jiyanê ye ku her tişt xwe li derdora wê digerîne. Di rewşên şer û ambargoyên ser herêmê de, hewceyî bi avakirina aboriya civakê heye. Û di bingeha wê de aboriya jinê ye ku bi aboriya komînal dorpêça ser Bakurê Sûriyê tê şikênandin Û da ku ev kooperatîf bi rengekî akadimîk bêne kirn proje hene.

### 59 KOOPERATÎFÊJİN AVAKİRİNE

Endama kordînasyona Aboriya jin a Herêma Cizîrê Hêvîdar Abdulah ser xebat, pêşketin û astengiyên derbas bûyî de da zanîn ku di vê slaê de 59 kooperartîfên jinê hatine kirin û wiha got: "Ji 59 kooperatîfan 6 jê kooperatîfên çandî bûn, ku em tam nerêxistinkirna kooperatîfan di civakê de û rewşa hewayê bidin ber çav heye astekê hemû kooperatîf bi encam bûn. Lê koperatîfên herî pêşketî anjî bi serketî bûn yên pêşesaziyê bûn."

### AKADİMİYA ABORİYA JİN BÊ AVAKİRİN

Hêvîdar bal kişand ser astengiyên ku bi wanre derbas bûne û wiha dom kir: "Jı bo Kooperatîfên çandî astengiya avê bû, ku jî rewşa hewayê ya kêm barîna barê bû sedema ku di milê çandiniyê de zêde encam nehate girtin. Lê astengiya herî mezin jî ku heya niha jî sîstema kooperatîf tam di civakê de nehetiya rûniştikandin ku mîna bazirganiyê lê dinerin, ji bo wê jî wateya kooperatîf nasnakin, ji bo wê pêwîstiya gel taybet jî jin perwerdeya aboriya xweser bibînin. Lê hîn akadimiyên me yên aborî ava nebûne, rastî ku projeya avakirina akadimiya aboriya jin di cîhanê de ev cara yekemîne; ji bo wê jî dem û xebat jêre pêwîste da ku jin bi xwe xebatê aboriyê bi rengekî rêixtiniû akadimî bimeşîne, her wiha dê di cîhanê de di milê aboriya jin de bibe gevek dîrokî."

### Jİ BO HERÊMÊN NÛ PROJÊ KOOPERATÎFAN TÊNE AVAKİRİN

Di çarçoveya koperatîfên ku îsla bi ser ketine Hêvîdar wiha gor: "koperatîfên yên herî serketî kooperatîfa destan bû an jî bi navê "pêşesaziyê" bi nav dikin. Wekî karên destan konsirwa, sêbze, firin, dukanên bazirganî û bazara jinê "Pepûla" bûn; tevî ku ev proje nûbûn jî lê, bi ked û xebata jinê bi serketin. Her wiha ji bo Herêmên nû hatine rizgarkirin jî proje hene wekî Şedadê piştî ku aramî û ewlehî çêbû, em wekî navenda aboriya jin dest bi rêxistinkirina jinê kir. Ser vê bingehê jî dest bi projeyên kooeratîfan hate kirin, wekî avakirina kargeha konserwa ku 5 jin tê de dixebitin û hewl didin ku hîn projeyên din ava bikin. Di heman demê de jî bajarê wekî Til Temir, Hol û Zergan jî heman tişt, lê Herêmên mîna Reqa û Tebqa meclisa jin kargehek jibo pêşxistina abotî avakiriye lê, wekî aboriya jin heya niha tenê me serdan kiriye lê hîn ji bo koperatîfên jin tam nehatiye rêxistin kirin. Da ku koperatîf di civakê de bibe çand gerkê jin xwe hesbike û di civakê de bibin her komînalî pêşbixin."



### KOOPERATÎF BİNGEHA ABORİYA CİVAKÊ YE

Endama kordînasyona Aboriya jin a Herêma Cizîrê Hêvîdar Abdulah tekez kir ku aboriya jin mîna pêngava şerê duyemîne û wiha bi dawî kir: "Ji ber jina ku ji bo parastina gel û welatê xwe şer dike, ev aboriya jin jî heman xebat û şer pêwîste ji ber ku aborî jî pêngava şerê duyemîne di vê şoreşê deye. Ji bo wê jî werka ku dikeve ser milê me parastina van destkeftiya ne, ev jî di riya xwe û civaka xwe di milê aborî de rêxistin kirine û bingeh abopriya komînal jî kooperatîfin tê, ji bo wê jî her jinek li himberî vê erkê xwe berpirsyar bibîne."

## Meclisa Jinên Sûriyê biryarên girîng girt

Di duyemîn civîna Meclisa Jinên Sûriyê de berdevkên bajêran hatin hilbijartin.

Desteya Rêveber a Meclisa Jinên Sûriyê civîna xwe ya asayî ya duyemîn li avahiya Meclisa Sûriya Demokratîk a navçeya Eyn Îsa li dar xist.

Bi dehan jinên ji herêmên cuda yên Sûriyê (Şam, Laziqiyê, Tertûs, Banyas, Qelemon, Reqa, Tebqa, Dêrazor, Minbic û Idlibê), berdevka Meclisa Jinên Sûriyê Lîna Berekat û Cîgira Hevseroka Desteya Rêveber a Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) Nûjîn Yûsif beşdarî civînê bûn.Di civînê de rapora salane ya xebatên meclisê hatin xwendin, beşdaran jî derbarê raporê de nêrînên xwe anîn ziman.

Di nîqaşan de girîngiya çalak kirina rola jin li hemû herêmên Bakurê Sûriyê hate ziman.

Di civînê de hin biryarên ku hatin girtin wiha ne:

-Perwerdekirin û çalak kirina hemû endamên meclîsê.

-Avakirina buroya teybet ji bo lêkolînên jinan.

-Avakirina komîteyên şaxan û xurtkirina komîteya doplomasî.

-Pêşxistina ragihandinê.

-Lidarxistina civînên desteyê bi awayekî asayî.

-Kampanyayeke li dijî tundiyên li ser jinan li ser asta Sûriyê were destpêkirin.

-Di mijara çareserkirina aloziya Sûriyê de komxebateke jinan li ser asta Sûriyê were lidarxistin.

Di dawiyê de Heyfa Mehmûd, Îlham Mutlî û Wela El-Nacî wekî berdevkên meclisê li herêmên rojhilat Tebqa, Reqa û Dêrazor hatin hilbijartin.

## Em ê ji bo azadiyê bixebitin

Namzetên jin ên ku di hilbijartina 30'yê Îlona 2018'an a ji bo Rêveberiya Herêma Şehbayê û Efrînê hatin hilbijartin gotin: "Em ê ji bo azadî û wekheviyê bixebitin."

Di 30'ê Îlona 2018'an de ji bo Rêveberiya Herêma Şehba û Efrînê hilbijartin hat çêkirin. Namzetên jin ên ku hatin hilbijartin derbarê xebat û hilbijartinê de axivîn û gotin: "Ev hilbijartinek demokratîk bû. Em ê xebatên xwe yê wekhevî û azadiyê bidomînin."

Zelox Reşîd diyar kir ku ew ê çarçoveya xebatên xwe yên ji bo gel berfirehtir bikin û wiha got: "Ji bo siberojek azad û aram em ê hewl bidin ku xebatên xwe pêştir bixin. Em ê di çarçoveya sîstemek wekhev û demokratîk de xebatên xwe bidomînin. Gelê me gelek êş û azar kişandin. Heta ji me bê em ê hewl bidin ku ev êş û azarana bi dawî bibin. Di plansaziya xebatên nû de em ê xebat û têkoşîna ji bo gel zêdetir bikin."

Muşîra Mele Reşîd jî anî ziman ku ew bi hêz û bi baweriya gel di hilbijartinan de bi ser ketine û wiha got: "Di nava şertên dijwar de me ev hilbijartin pêk anîn. Loma ev gavek girîng e. Xebatên me wê ji bo hemû gelan be. Bêyî ku em cudatiyê di navbera gelan de bikin em ê bixebitin. Em ê ji bo azadî û wekheviyê bixebitin. Ev hilbijartinek demokratîk bû. Em ê xebatên xwe yên ji bo azadiyê bidomînin."

Selwa Ecec jî wiha got: "Em ê ji bo hêviya gelê xwe bi cih bînin bixebitin. Em ê hêviyên gel geştir bikin û peywira xwe ya ji bo xizmeta gel bi cih bînin."…

***Ferîde Zade/Şehba***



## Koçberî

**Binevş SARYA**

Koçber û penaber du peyvên wisa ne ku di dilê mirov de birînên kûr vedikin û ew birîn ti caran qemûşî nagirin. Her kêliya li pişt xwe binêre, careke din xwîn ji wê birînê tê û dermanê sekinandina vê xwînê jî nîne. Lê ev her du peyv ne xeyalên miro yên jiyanê tenê tine dikin, heman demê paşroja mirov jî hildiweşînin. Heta jiyanê li ber çavê gelek kesan reş dikin û hebûnan tevan bêwate dikin. Di jiyana koçberan de ti caran hevalên wan yên bi salan çênabin. Lewre her roj li ciyekî ye û bi kesên nû re hevalitiyê dike. Cîranên salên kevin di bîranînên wan de nînin. Li ber deriyê wan darek koka wê stûr û bilind nîne. Gulên tovê bi salan li ber koka xwe reşandîn nînin. Lewre koçber in, mala wan li ser pişta wan e. Heta mala wan jî nîne, çend parçe cilên wan û du sê nivînên wan hene. Li malên koçberan pêwîstiyên zêde nînin. Lewre ka wê kengê ji wir werin deranîn ne diyar e. Hestekî xerîb e ku mirov li welatê xwe koçber be. Welatê te hebe lê ne yê te be, wê demê tu her kêliyê dimirî û careke din najî. Kî zane ka çiqas zehmet e dema mirov bi darê zorê ji mala xwe û welatê xwe were derxistin. Ez bawer dikim ku gelên Rojihlata Navîn vê êşê baş zanin.

Ez jî yek ji wan koçberên welatê xwe me, zaroktiya min jî bi koçberiyê û di nava hevalên demkurt de borî. Wê rojê çûbûm ciyekî. Li wir malbatên ji Efrînê koçber bûyîn hebûn. Pêwîstiyên wan yên jiyanê tev pêk hatibûn. Ji bo zarokan dibistanek hatibû vekirin. Zarokên wan li dibistana xwe ya nû bi zimanê dayîka xwe dixwendin. Di navberan de zarok bi dilşadî bi hev re dilîstin. Jixwe ciyê ez lê mêvan, hema li ber dibistanê bû. Di her navberê de bi dengê zarokan re em bêdeng dibûn. Min ew cesaret bi xwe re nedît ku ez derkevim li çavên wan binêrim. Lê min kêm zêde dizanibû ka wê çavên wan ji min re çi bêjin. Piştî du rojan min cesareta xwe kom kir û ez ji hundir derketim. Li ber derî li binê darekê rûniştim û min li wan temaşe kir. Di wê kêliyê de careke din bi wan re bûm penabera li welatê xwe. Min nedixwest li çavên wan binêrim. Lewre min baş zaniya ku li çavên wan binêrim, ezê zarokitiya xwe di çavên wan de zelaltir bibînim. Di wê navê re hevaleke min hat, got ka em biçin, ezê Hesenê şirîn bi te bidim nasîn. Em bi hev re çûn ber deriyê wan. Hesen û biraziya xwe li ber dêrî di nava tozê de dilîstin. Ser û berê Hesen di nava tozê de mabûn. Me her du zarok himbêz kirin û bi destên wan girt bi hev re em hinekî geriyan. Lê min dîsa ew hêz bi xwe re nedît ku li çavên wan binêrim. Destên wan bi qasî dilê wan yê piçûk germ bûn, kenê wan weke wan şirîn û bi hêvî bû. Lê mirovan baş dizanibû ku ew jî dizanin ku ew der ne mala wan e. Dibe ku mezinan ew bi hin xeyalên cuda dabin bawerkirin, lê wan dizanibû ku mala wan ya rast di nava daristanan de ye û hevalên wan yên berê ne ev bûne. Lewre zarokên wir tev cuda dilîstin û her kes bi hevalên xwe yên malbatê re bû. Hevalên wan yên zaroktiyê wê her demekê biguherin û wê bi hin kesên nû re bibin heval, heta vegerin mala xwe ya berê wê gelek hevalên wan yên nû çêbin.

# Li dijî Rêber Apo komployeke nû

**Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû diyar kir, dewleta Tirk mîna sala 1998'an dixwaze bi komployeke navneteweyî ji nava krîzê derkeve û got, “Hişmendiya komploya navneteweyî ya 9'ê Cotmehê bû sedem ku Tevgera Azadiyê ya Kurd û gelê Kurd di têkoşîna dijî komployê de hîn zane û xwedî tecrûbe bin.”**

Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû diyar kir, dewleta Tirk mîna sala 1998'an dixwaze bi komployeke navneteweyî ji nava krîzê derkeve, lê belê vê carê wê nikaribe vê bike.

Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû, bi wesîleya salvegera 20'an a Komploya Navneteweyî ya 9'ê Cotmehê axivî û diyar kir ku pêwendiya komployê bi armanca DYA'yê ya destwerdana li Rojhilata Navîn heye.

Karasû got, “Li Rojhilata Navîn sîstemeke nû nehatibû avakirin. Gelek pirsgirêk hebûn. DYA'yê dixwest ji aliyê leşkerî, siyasî, aborî û çandî ve dest li herêmê werde û li gorî daxwaza xwe dîzaynekê bike. Tevgera Azadiyê ya Kurd ku Rêber Apo pêşengî jê re dikir, ne tenê li Bakurê Kurdistanê rê li ber pêşketinên girîng vekiribû, di heman demê de li Başûr, Rojava û Rojhilat jî bandoreke girîng li Kurdan kiribû. Rêber Apo li ser bingeha biratiya gelan dixwest li Rojhilata Navîn sîstemeke nû ava bike. Têkoşîna PKK'ê ya bi pêşengiya Rêber Apo, hemû nokerên hêzên navneteweyî qels dikir. Hêzên navneteweyî dixwestin sîstemeke xwe dispêre hêzên hevkar ên herêmî li Rojhilata Navîn ava bikin. Bêguman vê rewşê tirs berdabû dilê nokeran û hêzên navneteweyî.”

Karasû da xuyakirin ku hebûna tevgereke xurt a mîna PKK'ê li pêşiya destwerdaneke bi vî rengî weke asteng dihate dîtin û got, “Bi rêya komploya navneteweyî ya li dijî Rêber Apo dixwestin PKK'ê bê bandor bikin û bi hêsanî dest li Rojhilata Navîn werdin.

Yek ji armancên vê komployê jî ew bû ku Tirkiye li Rojhilata Navîn were bikaranîn. Ji wan hebû, eger Rêber Apo dîl bigirin wê karibin hîn bi hêsanî Tirkiyê bi kar bînin.”

Mûstafa Karasû işaret bi sîstema zindanê ya Îmraliyê kir û got, “Ev sîstem ji aliyê hêzên komploker ên navneteweyî ve hatiye avakirin. Ji Tirkiyê re tenê rola gardiyanî hatiye dayin. Derbarê êşkenceya ku li Rêbertî hatiye kirin serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) hate dayin. DMME'yê li pêşberî vê serlêdanê helwesteke ku sîstema zordar a li Îmraliyê rewa û normal dike, nîşan da. Ev yek jî radixe pêş çavan bê sîstema li Îmraliyê ji aliyê kê ve tê parastin. Rewakirina zexta li Îmraliyê destûra ji bo dewleta Tirk e ku zext û zordariyê bidomîne. Dewleta Tirk dema dawî cezayê dîsîplînê û qedexekirina hevdîtinan ji bo 6 mehan li Rêber Apo birî. Ev yek di heman demê de êrîşek li dijî gelê Kurd e. Êrîşa fîzîkî û psîkolojîk a li Rêber Apo tê kirin, êrîşeke vekirî ya li dijî gelê Kurd e. Dixwazin moral û îradeya gelê Kurd bişikînin.”

Karasû bi bîr xist ku desthilatdariya AKP'ê ji aliyê siyasî ve li hundir û derve tengav bûye û di warê aborî de ketiye nava krîzê. Karasû destnîşan kir ku ev êrîş encama vê tengavî û krîzê ye û wiha dewam kir: “Desthilatdariya AKP'ê bi rêya vê êrîşê hewl dide xwe rizgar bike. Dewleta Tirk, mîna sala 1998'an ji aliyê leşkerî, aborî û siyasî ve tengav bûye. Weke endamekî NATO'yê di rewşeke zehmet de ye. Çawa ku sala 1998'an ji bo xwe ji vê rewşê rizgar bike piştgirî ji hêzên navneteweyî wergirt, DMME'yê jî bi biyara xwe re niha heman destekê dide dewleta Tirk.”



Karasû destnîşan kir, ji ber ku PKK a li ser xeta Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Tirkiye, Rojhilata Navîn û gelemperiya cîhanê veguheriye hêzeke xurt a îdeolojîk û siyasî, rewşeke wiha derketiye holê û got, “Kapîtalîzm û modernîteya cîhanê niha di nava krîzê de ye. Em vê rastiyê her roj bi rengekî berbiçav dibînin. PKK bi xeta Rêber Apo re bûye alternatîfa van krîzan. Ji xwe gelên Rojhilata Navîn xwe li nêrînên Rêber Apo digirin. Di nava xeta Rêber Apo de li rêya derketina ji nava krîzê digerin û dibin xwedî hêz. Ji ber vê yekê, hêzên navneteweyî tevî Tirkiyê li dijî Rêber Apo û Tevgerê dest bi komployeke navneteweyî kirin.”

Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû diyar kir, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û Tevgera Azadiyê ya Kurd ku êrîşên komploya 9'ê Cotmeha 1998'an şikandin, xwedî wê hêzê ne ku pêşî li vê komployê jî bigirin.

Karasû got, “Hişmendiya komploya navneteweyî ya 9'ê Cotmehê bû sedem ku Tevgera Azadiyê ya Kurd û gelê Kurd di têkoşîna dijî komployê de hîn zane û xwedî tecrûbe bin. Gelê Kurd bi wateya van êrîşên li dijî Rêber Apo û Tevgera Azadiyê zane. Hewldanên dewleta Tirk ku bi rêya van êrîşan dixwaze îradeya gelê Kurd bişikîne û Tevgera Azadiyê bê bandor bike, hewldanên pûç e. Rêber Apo, Tevgera Azadiyê ya Kurd û gelê Kurd wê sekna xwe ya têkoşerî ya li dijî van hewldanan bidomînin û pêşî li komployê bigirin.”…*ANF*

## Em li ber tecrîdê rabin, azadiya Rêber Apo bixwazin

KCDK-E bi wesîleya salvegera komploya navneteweyî ya 9'ê Cotmehê daxuyaniyek da û ji bo çalakiyên protestoyî yên li gelemperiya Ewropayê banga tevlîbûnê kir.

Dîwana Hevserokatiyê ya Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên li Ewropayê (KCDK-E) bi wesîleya salvegera komploya navneteweyî ya 9'ê Cotmehê daxuyaniyeke nivîskî da.

Di daxuyaniyê de hate bibîrxistin ku roja 9'ê Cotmeha 1998'an di şexsê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de li dijî gelên Kurdistan û Rojhilat Navîn komployeke navneteweyî dest pê kiriye û hate gotin, “Hêzên paşverû yên herêmê û hêzên serdest ên navneteweyî, modela çareseriyê û projeya jiyana azad û wekhev a hemû nasname û baweriyan ku ji aliyê Rêber Apo ve ji bo Rojhilata Navîn hate afirandin, li dijî xwe xetere dîtin. Hêzên navneteweyî di şexsê Rêber Apo de xwestin azadiya gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn dîl bigirin.”

### 20 SAL IN RÊBER APO TECRÎD DIKIN

Di daxuyaniyê de hate ragihandin, hêzên komploker ev 20 sal in Ocalan li Girava Îmraliyê tecrîd kirine û hate gotin, “Hêzên komploker naxwazin nêrîn û felsefeya Rêberê Gelê Kurd bigihêje mirovahiyê. Rêber Apo û berxwedana gelê me pêşî li planên komplokeran girtiye. Bi berxwedana 20 salan a li Girava Îmraliyê re lîstik û xefikên dewleta Tirk ji hev hatine xistin. Dewleta Tirk a faşîst bi girankirina tecrîdê re ji bo pêşî li paradîgmaya neteweya demokratîk a azadîxwaz û wekhev bigire, polîtîkayên xwe yên şer û kujeriyê giran dike.”

Dîwana Hevserokatiyê ya KCDK-E diyar kir, kiryarên asîmîlasyonê, qirkirin, zext û zordariya li gelên Kurdistan û Tirkiyê tên kirin û wiha dewam kir: “Ev komplo ji bêdengiya hêz û saziyên navneteweyî cesaretê digire. Biryara dawî ya Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê vê yekê bi awayekî zelal radixe pêş çavan. Sekna alîgir û bêdengiya saziyên weke CPT ji ber vê yekê ye.”

### BANGA JI BO ÇALAKIYAN

Di dawiya daxuyaniyê de hate bibîrxistin ku ji bo şermezarkirina komploya 9'ê Cotmehê wê li gelek cihan çalakî bên lidarxistin û ev bang hate kirin: “Weke gelê Kurd û dostên wan, li her deverê em dakevin qadan, komployê şermezar bikin, komplogeran teşhîr bikin û daxwaza azadiya Rêber Apo bikin. Bi navê KCDK-E em bang li gelê xwe û dostên xwe dikin ku 9'ê Cotmehê li Bruksel û Strasbourgê, 13'ê Cotmehê jî li hemû welatên Ewropayê, li Japonya, Kanada û Awûstralyayê tevlî çalakiyan bibin. Em li ber tecrîdê û komploya navneteweyî rabin û daxwaza azadiya Rêber Apo bikin.”

## Em ê ji bo Ocalan têkoşîna xwe dewam bikin



Behaa Hec Izet diyar kir ku Tirkiye bi tecrîda li ser Rêber Ocalan hewl dide îradeya gelê Kurd bişikîne û projeya neteweya demokratîk têk bibe.

Endamê Paritya Çepgir a Kurd a Sûriyê Behaa Hec Izet nerazîbûn nîşanî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan da û destnîşan kir ku dewleta Tirk a bi tecrîdê hewl dide pêşiya fikrên Ocalan bigre ku li Rojhilata Navîn belav nebe.

Hec Îzzet diyar kir ku bi saya fikr û felsefeya Ocalan biratiya gelan û jiyana hevbeş li Sûriyê û Rojhilata Navîn ava dibe.

Hec Izet diyar kir ku dewleta Tirk bi tecrîdê wê neghije armancên xwe û got, “gelê Kurd xwedî îrade ye û dest ji têkoşîna xwe û Ocalan bernade. Kurd wê heta dawiyê ji bo azadiya Ocalan têkoşînê dewam bikin.

Endamê Partiya Çepgir a Kurd li Sûriyê Behaa Hec Izet di dawiya axaftina xwe diyar kir ku têkoşîna gelê Kurd rewa ye, Ocalan rêberê Gelê Kurd e û ew ê heta dawiyê ji bo azadiya Ocalan têkoşînê bikin… *ANHA*

## Rûs, Îran û rejîma Sûriyê ne yek in



Ezîz KOYLUOGLU

Rejîma Sûriyê ev demeke weke ku her tîşt safî kirine û dixwaze weke dema berê ku xwe di hemû aliyan de muktedîr didît, tevbgire.

Rejîm naxwaze rewşa niha têdeye bibîne, ne jî 8 salên derbasbûyî. Niha di hemû gotinên xwe de dixwazin bêjin “a derbasbû, bû, êdî em ê wek berê xwe birêxistin bikin.”

Rejîma BAAS ku xwe bi faşîzmê rêxistinkiriye, derveyî xwe kesî qebûl nake. Desteka ji Rûsya û Îranê digre jî, ji bo xwe wek bingeha vê siyasetê bikartîne. Îran û Rûsya jî di bingeh de piştgiriyê nadin vê siyaseta rejîma Sûriyê. Lewre hem Îran hem jî Rûsya êdî wek berê siyaseta rejîma BAAS qebûl nakin. Bi taybet Rûsya êdî gihaştiye wê ferasetê ku rejîma BAAS nikare dewleta Sûriyê birêve bibe. Ji bo wê jî destekê nade siyaseta rejîma Sûriyê. Lê destekê dide hebûna dewleta Sûriyê. Vê yekê ji bo berjewendiyên xwe munasib dibîne

Îran jî weke demdirêj rejîma BAAS li dijî berjewendiyên dibîne. Ji bo wê hebûna Beşar Esad di berjewendiyên xwe de bibîne jî, wek sîstem hebûna BAAS ya xwe li ser nijadperestiya Ereb û Elewîtiya Nasûrî avakiriye ji bo Hîlala Şîî ya dixwaze biparêze wek metirsî dibîne. Îran him dixwaze hebûna xwe ya li Sûriyê dewam bike, him jî di avakirina Sûriyê de bandora xwe xurt bike. Niha di hevdîtinên li Astana/ Soçî û Cenevê de yên bi armanca pêşeroja Sûriyê tê kirin, wê destê xwe xurt bike.

Rejîma BAAS ku niha rêveberiya niha di destê faşîstan de ye, dixwaze bi desteka Rûs û Îran hebûna xwe bidomîne û dewleta Sûriyê li ser yek ziman, yek al, yek netew ava bike. Rejîma BAAS dixwaze dewletek merkezî hişk dîsa li gelên Sûriyê ferz bike. Vê ferzkirinê jî bi zimanek vekirî tîne ziman. Rejîma BAAS dixwaze vê siyaseta xwe ya li ser faşîzmê birêxistin kiriye bi hevkarên xwe Rûs û Îranê jî bide qebûlkirin.

Niha ji bo pêşeroja Sûriyê sê projeyên cûda yên bloka alîgirên rejîmê hene. Rûsya dixwaze Sûriyeke otonom bê avakirin. Rûsya di destûra xwe ya ji bo Sûriyê avakiribû jî, wek madeyeke sereke derxistibû pêş. Di vî alî de Rûs û rejîma Sûriyê ya BAAS di mijara Sûriya pêşerojê de bi nakok in.

Îran jî Sûriyeke ne BAAS dixwaze. Lê desthilatiya Beşar Esad ya Elewî ji bo xwe jiyanî dibîne. Rêjîma Îranê dixwaze dewletek navendî û di mijara rêveberiyên herêmî de hinek nerm esas digre. Siyaseta Îranê jî di vê mijarê de bi rejîma BAAS re bi nakoke.

Rejîma BAAS jî, eşkereye dixwaze dewleta navendî û faşist bidomîne. Lê li Sûriyê dagirkeriya dewleta Tirk ya li Îdlib, Ezaz, Efrîn, Bab û Cerablûs'ê dewam dike. Li gelek herêman dagirkeriya DAIŞ'ê didome. Yekparebûna axa Sûriyê di bin metirsiya rejîma dewleta Tirk de ye. Lê rêjîma Sûriyê hê jî qala dewletek navendî dike.

Hevkarên rejîma Sûriyê wê van nakokiyan çawa çareser bikin û Sûriyeke pêşorojê wê çawa bê avakirin? Di vî alî de jî ne diyar e. Xuya ye wê di dema pêşiya me de nakokiyên hevkarên rejîma Sûriyê zêdetir bibe. Lê projeya çareseriya krîza li Sûriyê danûstendin û Sûriyeke ne navendî ye. Sûriyeke federal û demokratîk ya herî guncav e. Meclîsa Sûriya Demoratîk jî dema bi rejîma Sûriyê û hevkarê wê Rûsyayê re hevdîtinan dikin, wan mijaran eşkere tînin ziman.



# Serhildanan nîşan da ku gelê Kurd yek e

**Hevseroktiya Konseya Rêveber a KCK'ê bi daxuyaniyeke nivîskî şehîdên serhildana Kobanê ya 6-7-8'ê Cotmeha 2014'an bi bîr anî û diyar kir van serhildanan li Kobanê dawiya DAÎŞ'ê anîne. KCK'ê wiha got, “Van serhildanan li Kobanê dawî li DAÎŞ'ê aniye. Serhildanê 6-7-8'ê Cotmehê nîşan daye ku gelê Kurdistanê li çar parçeyan bi yek hîsê ye.”**

Hevseroktiya Konseya Rêveber a KCK'ê şehîdên serhildana Kobanê ya 6-7-8'ê Cotmeha 2014'an bi bîr anî. KCK'ê diyar kir van serhildanan li Kobanê dawiya DAÎŞ'ê anîne.

Hevseroktiya Konseya Rêveber a KCK'ê di salvgera serhildana 6-7-8'ê Cotmeha 2014'an ya ji bo piştgiriya berxwedana Kobanê li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê dest pê kirî daxuyaniyeke nivîskî da.

KCK'ê di daxuyaniyê de got, ''2014, 6-7-8'ê Cotmehê salvegera 4'an a serhildana piştgiriya berxwedana Kobanê ye. Em yên ku di van serhildanan de şehîd bûne bi hurmet û minet bi bîr tînin. Vîna wan a berxwedanê li hemû parçeyên Kurdistanê wê bibe sonda serfiraziyê ya jiyana azad û demokratîk. Em ê bêrîkirinên wan teqez bi Kurdistana azad û demokratîk tacîdar bikin.''

KCK'ê destnîşan kir ku serhildanên 6-7-8'ê Cotmehê yên piştgiriya berxwedana Kobanê DAÎŞ ber bi têkçûnê ve biriye.

KCK'ê got, ''Van serhildanan li Kobanê dawî li DAÎŞ'ê aniye. Serhildanê 6-7-8'ê Cotmehê nîşan daye ku gelê Kurdistanê li çar parçeyan bi yek hîsê ye. Bi van serhildanan nîşanî hemû cîhanê dane ku Kurd bûne neteweya demokratîk a ku ji bo azadiya xwe li ber xwe didin.''

### GEL HELWESTA XWE NÎŞAN DA

6-7-8'ê Cotmehê li tevahiya Bakurê Kurdistanê ciwan, kal û pîr, jin, zarok, hemû gel daketin meydanê. Bi qêrînan gotine ku berxwedêrên Kobanê ne tenê ne. Li dijî desthilata AKP'ê ku destekê dide DAÎŞ'ê jî hêrsa xwe nîşan dane. Bi taybetî bersiveke xweş dane gotina Tayyîp Erdogan ku gotibû, “Kobanê li ber ketinê ye.” Tayyîp Erdogan li ser hîmê ku Kobanê bikeve dest DAÎŞ'ê hesab kiriye ku têkoşîna azadiya Kurd bi paş ve bibe. Kobanê li ber xwe daye û ev berxwedana gelan hesabên Erdogan têk birine.

Gelê Kurd û ciwanên wê bi rihê serhildanên 6-7-8'ê Cotmehê ya ji bo desteka berxwedana Kobanê divê tevlî nav têkoşînê bibin. Bi serhildanên 6-7-8'ê Cotmehê me çawa polîtîkaya çewisandina Tevgera Azadiyê ya AKP'ê ya bi destê DAÎŞ'ê pûç kiribe, bi heman rihî polîtîkayên qirker ên desthilata AKP'ê jî wê were têkşikandin.



Dethilata AKP'ê piştî serhildana 6-7-8'ê Cotmehê bi rengê ku xwe bavêje ber lingê Rêber Apo û Tevgera Azadiyê tika kiriye ku serhildan raweste. Di wan şertan de ku rewşa bê şer didomî, çalakiyên destekdayina berxwedana Kobanê piştî ku gihaştine aramanca xwe bi dawî bûye.

Desthilata AKP'ê ya ku li ser polîtîkaya qirkirinê rawestiyaye, bi desteka dewletan û NATO'ê her çendî êrîşên xwe bidomîne jî li hember têkoşîna azdiyê ya gelê Kurd wê nikaribe xwe ji têkçûnê bifilîtîne..

Di salvgera 6-7-8'ê Cotmehê de, ev giyanê berxwedanê wê di têkoşîna me de were jiyîn, berxwedana me ya Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê bi serfiraziyê were tacîdarkirin, Kurdistana Azad û Tirkiya Demokratîk wê were avakirin.''

## Kongra Gel banga tevlîbûna çalakiyan kir



Kongra Gel, banga tevlîbûnên xurt a çalakiyên li Brûksel û Strasboûrgê kirin. KONGRA GEL got: “Komplo negihişt armanca xwe. Bi pradîgmaya azadiyê ya Rêber Apo bi berxwedana dîrokî ya li Îmraliyê kir ku têkoşîna azadiyê derbasî Kurdistanê bibe.”

Dîwana Hevserokatiya Kongr Gel, bi boneya 20'emîn salvegera Komploya Navneteweyî ya 9'ê Cotmehê daxuyaniyek nivîskî da. Di daxuyaniyê de hemû hêzên ku di nava komployê de cihgirtin û dîsa ji ber berjewendiyên xwe yên qirêj Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dîl girtin xeyalên azadiya gelên Kurdistanê kirin hedef hate şermezarkirin.

Di daxuyaniyê de minetdariya şehîdan a bi dirûşma ‘Hûn nikarin roja me tarî bikin’ xelekek ji agir li dorî Ocalan çêkirin bibîr anî û got “Em wan qet ji bîr nakin. Bi Rêbertiyeke azad û Kurdistaneke azad em ê xeyalên wan bi teqez jiyanî bikin.”

Di daxuyaniyê de bal hate kişandina ser van xisûsan:

“Komploya Navneteweyî ya 9'ê Cotmeha 1998'an a ku li ser bingehê berjewendiyên xwe gelê Kurd hate qurbankirin û ji bo planên xwe yên herêmî bi cih bînin negihişte armanca xwe. Armanca sereke ya vê komployê ew bû ku di kesayeta Rêber Apo de Tevgera Azadiya Kurdistanê tesifiye bike yan jî bixe bin kontrolê. Bihêlin tesfiyekirinê, bi pradîgmaya azadiyê ya Rêber Apo bi berxwedana dîrokî ya li Îmraliyê kir ku têkoşîna azadiyê derbasî Kurdistanê bibe û kir ku bibe têkoşîna azadiyê ya gelên Rojhilata Navîn. Li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê weke şoreşa serdemê jiyanî bû. Li gel pradîgmaya civakî, demokratîk, ekolojîk ku xwe dispêre azadiya jinê, li tevahî cîhanê bû dengê mirovahiya pêşverû.

Tecrîda heyî ya li dijî Rêber Apo tê kirin êşkence ye. Di nava şert û mercên tecrîda heyî de 6 meh cezayê disiplînê tê dayîn. Bêdengiya CPT a li dijî vê bi tu awayî nayê qebûl kirin. Divê bi teqez di vî demî de em xwedî li Rêber Apo derbikevin. Hefteya pêşiya me wê ji bo protestokirian komploya 9'ê Cotmehê çalakiyên berfireh werin lidarxistin. Di çarçoveya xwedî derketina li Rêber Apo de em banga tevlîbûnekî bi hêz li hemû kesê dikin.”

Kongra-Gel di dawiya daxuyaniyê de ev bang kir;

“Bi armanca şermezarkirina komploya 9'ê Cotemhê bi pêşengiya TJK-E roja 9'ê Cotemhê li pêşiya Konseya Ewropa li Strasboûrgê, dîsan heman rojê li pêşiya Komîsyona Yekîtiya Ewropa a Brukselê wê çalakî bên kirin. Em bang li hemû kesên li dijî rejîma faşîst a dewleta Tirk dikin ku bi hêz beşdarî çalakiyan bibin.”

## Komxebata jinên Sûriyê li Kobanê pêk hat

Komxebata çalakvan û hiqûqnasên jin ên Sûriyê li bajarê Kobanê pêk hat. Di beşa yekemîn a komxebatê de hevpeyman û biryarên navneteweyî yên girêdayî jinan hatin gotûbêjkirin.

Li bajarê Kobanê bi beşdarbûna nêzî 200 çalakvan û hiqûqnasên jin ên ji herêmên cuda yên Sûriyê di bin dirûşma “Ji bo mîsogerkirina mafên jinan di destûra bingehîn de li ser bingeha avakirina Sûriyke demokratîk” komxebatek hate lidarxistin.

Koordînatora giştî ya Meclisa Jinên Sûriyê Lîna Berekat axaftina destpêkê ya komxebatê kir û destnîşan kir ku di şerê Sûriyê de bêtirî 24 hezar jin hatine kuştin û 57 jin di bin îşkenceyê de hatine kuştin û 8 hezar û 633 jin hatine revandin û windakirin.

Lîna diyar kir ku hejmareke mezin ji jinan bi tundiya cinsî re rû bi rû dimînin û hejmara ku hatiye qeydkirin 7 hezar û 699 jin in û 432 jinên ku temenên wan kêmî 18 saliyê rastî destdirêjiya cinsî hatine.

Lîna Berekat di berdewama axaftina xwe de anî ziman ku jinên Sûriyê û bi taybet jinên herêma Efrînê ji ber dagirkeriya Tirkiyê û komên çete yên girêdayî wê rastî dijwariyên mezin hatine û wiha dewam kir: “Kes nikare çeteyên ku bi cenazeyê şehîd Barîn Kobanê lîstine, paşguh bike. Jinên Siwêdayê jî ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê de hatine revandin û kuştin.”

Lîna Berekat di dawiyê de ev tişt got: “Em wek jin divê em destkeftiyên xwe biparêzin û em bi rola xwe ya rasteqîn û çalak di çareserkirina aloziya Sûriyê de rabin. 8 salên şerê Sûriyê de herî zêde jinan ziyan dîtiye û buhayên giran dane. Em niha beşdarnekirina jinan di danûstandinê de qebûl nakin, divê mafê jinan di destûra bingehîn a nû ya Sûriyê de bê parastin.”



Hevseroka Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Sîham Qeryo jî bendên hevpeyman û biryarên navneteweyî yên girêdayî mafên jinan xwendin. Qeryo behsa pêwîstiya beşdarkirina jinan di hemû aliyên jiyanê de kir.

FENER

## Netewa Demokratîk werîsê rizgariyê ye



Idrîs HENAN

Li Rojhilata Navîn pirsgirêkên zihnî bi ser avê dikevin. Ne tezên ku xwe dispêrin tenatiya nirxên Rojhilata Navîn dikarin bi tena xwe bi ser bikevin, ne jî yên rojavayî dikarin li Rojhilata Navîn xwe ferz bikin. Ji bo ku ev yek pêkan be, pêwîstî bi sentezeke ku xwe dispêre zanista rojava û nirxên ruhî yên Rojhilata Navîn (komînalbûyîn, civakbûyîn, exlaq,... hwd) heye. Sentezeke wiha dema ku nûbûyînekê bi xwe re bîne, wê çaxê em dikarin bibêjin ku li Rojhilata Navîn guhertineke cidî çêbûye. Derveyî vê yekê ceribandina tezên biyanî û yên rizî ye. Ger em bi çavê îro li rûdan û pêşketinên li saha Rojhilata Navîn binêrin, em ê bibînin ku hîna jî qada vê herêmê rûbirûyî herdu xetên guherîna bi zorê û xeta dogma ya ku ji binî de reforman red dike ye. Ango li hemberî herdu xetên liberal û îslama siyasî ye. Aliyê liberal dixwaze vê herêmê li gorî berjewendiya desthilatdariyê ava bike. Aliyên dijber di nav xwe de bihelîne û aliyên rikber jî îzole bike. Îslama siyasî jî ku paradîgmaya xwe naspêre pêşketina zeman û mekan, dixwaze civakê li gorî zihniyeteke ku zêdeyî 1400 sal di ser re derbas bûye bi rê ve bibe. Tişta balkêş, herdu alî jî zihniyeta hev û din bi kar tînin! Aliyê liberal bi dogmatîzma aliyê selefî civakê li ser esasê kolekirinê bi rêxistin dike. Aliyê dîtir jî bi rêbazên zanistî dogmatîzma xwe tekûztir û hişktir dike. Ango herdu alî jî rûyê heman pereyê ne. Paradîgmaya herduyan tevî ku di şêwaz û islûb de cudayî hev in, xwedî yek armancê ne. Ew jî xesibkirina îradeya civakê û li gorî berjewendiya desthilatdariyê avakirina rêveberiyên destpot e.

Niha li Sûriyê şerê van herdu aliyan ya desthilatdariyê diqewime. Di encamê de sîstemên ku dixwazin bi rêbazên berê destpotiya xwe bidomînin têk diçin. Mînakên wê sîstemên dîktator ên Baas, AKP-MHP, Melalî, ixwan mislimîn… hwd in. Ji ber vê nakokiya herdu tezan ku rê nadin senteza gelan, pirsgirêka gelên li vê qadê kûr bûye. Perelelî rikberiya herdu tezan û kûrahiya kirîza ku veguheriya kaos, zemîna şoreşa zihnî li Rojhilata Navîn ava bûye. Ev zemîn bi nakokiyên sîstemên ku xwe dispêrin fikrên perjewendîperest, nijadperest û olperest re, rojane amadetir dibe. Felsefeya Netewa Demokratîk a ku Rêber APO afirandiye di vê zemînê de şaxên xwe berdaye û pêşengtiya şoreşa zihnî li Rojhilata Navîn dike. Senteza Netewa Demokratîk ku li ser hîmên pêvanên ruhî yên exlaqî û metodên zanistê hatiye hunandin, li hemberî herdu tezên me li jor qalê kiriye, tekane riya çareseriya aloziya Rojhilata Navîn e. Ev ne nepixandin û ne jî alîperestî ye. Tam berovajî, pêvajoya aloziya Sûriyê ya nêzî heşt salan e, têkoşîna gelan a li Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê vê nerîna me piştrast dike. Di encama têkoşîna gelên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, li ser bingehên paradîgmaya jiyana azad û hevbeş vîna gelên Sûriyeyê tevî hemû hewldanên têkbirinê bi ser dikeve. Ev jî xwe dispêre latên ideolojîk ên felesefeya Netewa Demokratîk. Netewa Demokratîk gincawkirina herdu nirxan (zanist û pîvanên ruhî) bi awayekî nû ye. Biserketina şoreşa zihnî li Rojhilata Navîn tê maneye ku wê demokrasiya Rojhilata Navîn a Ewrûpa jî derbas bike. Di heman demê de wê kirzîa destpotên Rojhilata Navîn hê girantir bike. Ancax bi şêwazê xwe gihandina armancan a felsefeya Netewa Demokratîk zihniyeta serkeftî di şexsê gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de xwe bide ifadekirin. Derveyî vê şêwazê, wê di behra herdu tezên liberal û îslama siyasî de avjeniya mirinê be.